



Ji nivê sedsala XIXan û vir da xebatên akademîk derbarê folklorê da dihêne kirin. Bi taybetî jî edebîyata gelêrî, ku şaxek ji folklorê ye, bala lêkoleran û berhevkaran kişandîye. Eger em xebatên Mela Mehmûdê Bazîdî li alîkî daynin, ji serê sedsala XXan ve edebîyata gelêrî ya kurdî jî bala berhevkar û lêkolerên kurd kişandîye. Lê pîraniya van xebatan di çarçoveya berhevkarîyê da hatine kirin. Li gor wan, xebatên akademîk derbarê edebîyata gelêrî ya kurdî da ne pir zêde ne. Pirtûka Necat Keskin ya bi navê *Folklor*

û Edebîyata Gelêrî yek ji van xebatên akademîk e ku edebîyata gelêrî ya kurdî bi hûrgulî dinirxîne û hewl dide dabeşkirina wê bike.

Pirtûk ji çar beşên sereke pêk dihê. Di beşa yekem da wekî têgih li ser pê-naseya folklorê û paşxaneya dîrokî ya zanista folklorê rawestîyaye. Herweha mijarên sereke yên zanista folklorê û çavkanîyên vê qadê jî hatine nasandin. Beşa duyem derbarê dîrok û çavkanîyên folklorê kurdî da ye. Di vê beşê da nivîskar hewl dide xebat û çavkanîyên têkildarî folklor û edebîyata gelêrî ya kurdî bide naskirin. Çavkanî û xebatên ku hatine kirin hem ji alîyê kronolojîya dîrokî hem ji alîyê herêmên ku kurd lê dijîn ve hatine dabeşkirin. Nivîskar balê dikişîne ser xebatên derbarê edebîyata gelêrî ya kurdî ku di serê sedsala XXan da ji alîyê rewşenbîrên kurd yên wekî Xelîl Xeyalî, Hilmîyê Swêregî û Law Reşîd ve hatine kirin. (r. 88-94). Lê ev xebatên ku nivîskar behsa wan dike hewldanên kesên navborî ne ku di kovarên kurdî yên destpêka sedsala XXan da hatine weşandin. Van kesên hewl dane balê bikşînin ser dewlemendî û giringîya folklorê kurdî lê tenê berhevkarîya berhemên edebîyata gelêrî kirine. Di xebatên van kesan da qet

* Doç. dr, Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê. Beşa Çand û Zimanê Kurdî. E-mail: mustafaaslan@artuklu.edu.tr

behsa beşên din yê folklorê, wekî mînak cil û berg, xeml, xîşrê jinan, çêkirina xalîçeyan, hwd nehatîye kirin.

Beşa sêyem û çarem ku mirov dikare wekî yek beş jî qebûl bike derbarê edebîyata gelêrî ya kurdî û beşên wê da ne. Di van her du beşan da, piştî pênasekirina têgiha edebîyata gelêrî û pêşkêşkirina nerînên derbarê vê qadê da, nivîskar dabeşkirina edebîyata gelêrî ya kurdî dike.

Mirov dikare behsa du taybetmendiyên sereke yê xebatê bike: ya yekem ew e ku ji aliyê çavkanîyên teorîk û dîrokî yê derbarê folklorê û edebîyata gelêrî ve, xebat têra xwe dewlemend e. Bi awayekî kronolojîk nivîskar cih daye nêrînên pisporên sereke yê qada folklorê yê wekî A. N. Veselovski, V. F. Miller, V. Propp, A. Dundes, R. M. Dorson, R. Baumann û W. R. Bascom. Ji xeynî van çî ji hêla dîrokî çî ji hêla teorîk ve nivîskar cih daye nîrxandinên gelek pispor û nivîskarên din jî. Ji ber vê yekê pirtûk ji rehbera ji bo nasandin/ naskirina qada folklorê û edebîyata gelêrî zêdetir xebateka teorîk û analîtîk e. Bi vî aliyê xwe yê teorîk pirtûk ji bo lêkolerên ku di qada edebîyata gelêrî bi giştî û edebîyata gelêrî ya kurdî da bi taybetî kar dikin pir sûdmend e.

Taybetmendîya duyem ya vê xebatê ew e ku cara yekem ceribandinek derbarê dabeşkirina beş û binbeşên edebîyata gelêrî ya kurdî da hatîye kirin. Di vê ceribandinê da binavkirina berhemên edebîyata gelêrî ya kurdî jî hatîye kirin ku ev jî tiştêkî nû ye. Bêguman Celadet Bedirxan di kovara Hawarê da berhemên edebîyata gelêrî ya kurdî dabeş kirine. Lê ev dabeşkirineka sînorkirî ye. Berovajî wî Necat Keskin di vê xebata xwe da bi awayekî berfireh berhemên edebîyata gelêrî di gel navên wan dabeş dike. Jixwe nivê pirtûkê zêdetir (161 rûpel) ji vê dabeşkirinê û nîrxandinên derbarê wê da pêk hatîye.

Necat Keskin edebîyata gelêrî ya kurdî bi giştî kirîye du beş: vegotina gelêrî û helbesta gelêrî. Vegotina gelêrî di bin heft binbeşan da hatîye dabeşkirin: Mît, efsane, destan, hîkayên gelêrî, serborî, çîrok û pêkenok. Lê helbesta gelêrî di bin yek sernavî da hatîye pêşkêşkirin û nivîskar hemû cure stran, zêmar jî tê da, xistine nav beşê. Mamik û zûgotinok jî ku ji aliyê nivîskar ve wekî helbesta gelêrî hatine qebûl kirin, di beşê da cih girtine. Herweha çend beşên giring yê edebîyata gelêrî ya kurdî, wekî gotinên pêşyan, biwêj, slavdayîn, dua û nîfir ji derveyî van her du beşên sereke hatine girtin û di bin sernavê, “cureyên din yê edebîyata kur-

dî ya gelêrî” da hatine komkirin. Ev polînkirin ku mirov dikare wekî teşebuseka ceribandîne binirxîne hin alozîyan di xwe da dihewîne. Wekî mînak polînkirina mamikan wekî helbest yan nirxandina gotinên pêşîyan, ku wekî cureyek ji derveyî vegotina gelêrî, beşek sereke ya edebîyata gelêrî ye. Ev alozî wê teqez bala xwendevanan bikişînin û bibin hedefa tîrên rexneyan. Lê divê nehê jibîrkirin ku bêyî ceribandin mirov nikare bigihîje encameka rast û ev ceribandina Necat Keskin wê bibe alîkar ji bo gihîştina encameka rast derbarê polînkirina edebîyata gelêrî ya kurdî da.